Cêmis Ciwîs di rexna edebî ya nû da Vekolînek di romana nûxwaz û zaravê wêjeyî monoloja hindurî da

Pişka êkê

wergêran Tehsîn Navişkî

Vekolîn Şakir Norî

Vekirin

Demê em tûşî vekolînê li ser romannivîsekê mezinê, ji terzê

Cêmis Ciwîsî dibîn; divêt em li semtên romana nû bi geryêyin; çunke Ciwîsî bandora xwe li ser romana niglstanê bi tinê nekirî ye, di bît bandora xwe di hemû têgehên romana cîhanî yanû da kirî ye. Ev vekolîne bi pila yekê, pêkolê dike ji bo lêgeriyana wan mîtodên wêjeyî, ewên serederî digel karên filiyane yên Ciwîsî yên romanî kirîn, bi rêka hizirkirina wê bi kûrî, li ser teknîka serekî di cîhana wî de; ewa di hersê romanên xwe de bi kar hînayî wênê hunermendî di lawîniyê de 1916, Yolîsîs 1922 û şevbêriya finîganî 1939; wek mîtodekê saykolojî di hilêvrîna rehendên cîhanên hindurî yên kesokiyan, bi rêka havlîbestina agehiyê bi neagehiyê ve, di mejyê mirovî û serbora wî de.

Ev teknîka nû ya bi navê şepola hişyariya yan monoloja hindurî; wek firensî dibêjinê, şiya we li Ciwîsî bike ku pitiriya

hizir û sozan, bi şêwazê jêvekirinane û nihênî bi wênên pêşkevtî berceste dike.

Demê pêkola vexandina Ciwîsî dihê kirin, divê em bi tiyora ciwankariyê, ewa ji teknîkê û şirovekirina derûnî pêk dihê xwe piştgerm bikin; çunke ewin dibine gewherên serekî yên filyên Ciwîsî di romana nû de. Vekolînên saykolojî li ser romanên Ciwîsî, dawiyê dihêne guhurîn bo vekolînên biyografî; yan jî bi duristî çênabe bihêne cudakirin ji jiyanama xûy; çunke dahênana Ciwîsî, hebe nebe, serborên jiyara wî yên taybetin; wek huner veguhaztîn.

Ev vekolîne pêkoleke pêxemet vekolîna rêbaza romana nû û zaravê monoloja hindurî yan rewtê hoşyê ewa Ciwîsî bi şêwazekî filiyane bi kar hînayî. Ev vekolîne pêxemet wê çendêye, ji bû bi destive hînana du armancên serekî:

Ya yekê: Vekolîna teknîkê ewa Ciwîsî di romanên xwe da bi kar hînay; wek montajkirinê, filaşbag û hevpeyvînên hindurî. Ev şêwaze, berba dikin, kanê çi tiştê nihênî di cîhana kesokiyan da heye.

Ya dwyê: Havlyên binaxeyî, li navbera vê teknîkê û nêrîna Ciwîsî ya saykolojî. Romanên Ciwîsî, ewin verêjê guncandineka hûr e li navbera cîhana wî ya hişyarane û ya nehişyarane. Ango Ciwîs bi şêwazekê kûr tê de gehişt, havlî li navbera hişyariya xwedî û hişyariya cîhana mijarane bi rêka

têgehiştina hêzên dahênanane yên hoşî ye. Bi rêka mîtodên rexneyî yên nû, em gehiştîne wê çendê, dibe em di cîhana Ciwîsî bigehîn, bi rêka sê astên tiyoriyane:
1 - nêrîna ciwankariyane, teknîk.
2 - nêrîna saykolojî, nehoşî.
3 - nêrîna dastanî, mîtolojiya girîkî.
Ev hersê nêrînîn henê, cîhana Ciwîsî ya endameyane pêk dihînin. Ya hejî bîranînêye, hemû rexnegirên cîhanî ewên verêjên nivîskî yên Cêmis Ciwîsî êxistîne jêr tîjkên rexnê û şirovekirinê, danpêdanî bi wê çendê kirî ye ku xwandevanê heçku heyî; demê romanên wî dixwîne, zehmeteka yekcar mezin pêve dibîne. Dibe di binî de xwandevan nikare Ciwîsî bixwîne; heger bi alîkariya pertûka nîşandera xwandevanî bo Cêmis Ciwîsî nebe, ewa nivîserê wê Wiliyem Yorg Tindalê mamostayê wêjê ingilîzî li zankoya Kolombiya li Emrîka danaye. Eve piştî pitiriya jiyê xwe bi vekolîna verêjên Ciwîsî ve boranadî û pêşkêşî xwandevanî kirîn.
Karê Ciwîsî, çi pê nevê, xebateka berdewame, nivîserî jiyara xwe hemû bêşikirî; pêxemet hunerê xwe yê romanê. Têra heye em li bîr bihînîn Ciwîsî heft salên rebeq bi nivîsîna şakarê xwe yê navdar ve Yolîsîs ve bûrandin. Dîsa hevde sal bi nivîsîna romana xwe ya dawiyê ya hizar berperî şevbêriya fînîgan ve borandîne. Bi rastî em ji derheq dernakevîn Ciwîsî bixwînîn; heger bi rêkab mîtodên wêjeyî nebe, ewên hatine bi karhînan, ji ber wê çendê karên wî verêjên serbora jiyanamaka kûr in. Zêdebarî wê çendê, berî hemû tiştî, serboreke ji layê zimanîve. Wekî di yar; heta xwandevanê niglstanê jî zehmetê di di vekirina çevengên wî de û pêkhatyên zimanî wî yê mijdar wij zehmetê barikirî dibînît. Ev vekolîna nivîsîna wê sallekê vekêşaye, hêvî ew e wênekî ji filîvaniya Ciwîsî bide xwandevanî û giringiya wî bihê berçavkirin, di rexna wêjeyî ya nû û romana hevçerx de.

Monoloja hindurî: Zarav û têgeh di romana nû de:
Têgehê monoloja hindurî, piştî cenga cîhanî ya yekê rohin bû; wek şêwazekê vegêranê, yê ku li ser şabûta şebengê zal dibe û rolê kiryara hoşî li cem kesokiyê xurt dike. Her wesa, bîrhatin,

hestpêkirin, kêşekiyên korane û zanîna hestiyarane têkelî hizirên hoşî û nîvhoşî dike. Ya hejî gotinêye, Wiliyem Cêmis yekemîn kese monoloja hindurî, di pirtûka xwe ya bi nav û nîşanên pirinsîpên saykolojî da bi kar hînaye.

Ji bo sînor danê, biliqên lêhimiştî, ya hizran di eqlê hişyar de,



piştî hîngê di romana nû de hate bi karhînan. Dîvîd Dîgis di pirtûka xwe ya bi navê roman cîhana nû de li sala 1960 têgehê monoloja hindurî sînor dide; demê dibêje: "Teknîka monoloja hindurî, wesa bi sanahî nabe rêka saloxdana rewşên mêjkê ademîzadî; çunke vê rêkê gelek bi kar hînanên din yên heyin, bo teknîka efirandina kesokiyan û vegêranê 1.

Bi rastî Ciwîsî ev teknîke ji dev xwe nehînaye der. Rastiya wê bi şêwazekê filîvanane bi kar hînaye. Wekî diyar romannivîsên çerxê fiktorî jî, ji çaxekî bo çaxekî bi kar hînaye. Her wesa Cîn Wistin, Filîd Nik û Di îvoy jî, ev şêwaze bi kar hînayne. Belê nivîserên hevçerx daxbarbûn bi vedîtinên çarekirinên nojdariyê. Mebesta wan ew bû, ji dîtina panoramî ya civakî bo eqlê kesî biveguhêzin. Nivîserê firinsî Edward Dogardin tirmê monoloja hoşyê yan monoloja hindurî diçîrokeka xweda bi kar hînaye. Dîsa marsîl birositî jî ev teknîke dahênanane bi kar hînaye.

Bi serihelbûyên saykolojî divî çerxî da, nemaze bi serihelbûna Yûngî ji bû vavartina kêşekiyetên xuser; wek alav di çarekirina alozyên eqlî da wityoryên Firoyîdî di şirovekirina deronî da, harîkariya romannivîsên nû kir ku pitirê biçine di kûratiya derûna mirovî da. Rexnegir Dîvîd Dîgis pêve diçît, di pênasekirina xwe da bo monoloja hoşiyê dibêje: şêwazê monoloja hoşyê, di hûrtirîn û bi hêztirîn pênaseyên xwe da,

şiyana wê bi destive hînana kûratyê; mîna bi destive hînana rêka çavlêkera berfirihekirinê ye. Ew kesokiyên der vey demî û cihî, bi di û ramanan pêşve dibe. Ya yekê: Ew pêşêxistina hoşyê cudad ket ji zincîra rêzibenda bûyeran. Ya dwyê: Ew di hêlît saxleta rewşa eqlî ya didet, bi şêwekê durist lê bigeryêt, ji ber hokarê dûvçûna kêşekiyetan û migirtyên eqlî yîn dûr û vederikirîn, ewên ku pêdivî xwe girtinê nebin bo demekê dirêj, da belkyên riyalsitî hişiyariken, berî hemûyê bibînin. 2



Hindî teknîka monoloja hoşêye, amirazeke ji amirazên pêşkêşikirina bersivên kesokiyan û bîrihatinên wan, hemberî bûyeran. Nivîserê romanê, demê pêşkêşikirina rewşa eqlî ya kesokiyan, di kart taybetmendî wixurstyê serbora gava dîrokî ya kesokyên xwe aşkera ket. Di heman çax da, di kart rastiyan sebaret raburdûyê jiyara kesokyên xwe; heta nuke bi rêka lêzivirîna zincîra bûyerên berê rûday; mîna Ciwîsî di şakarê xwe Yolîsîs de kirî pêşkêş bike.

1 -monoloja hoşyê: Wek teknîk û rêbaz, bo şirovekirina derûnî.

2 Diblin: Wek bajîrekê dîrokî yê filîvaniya Ciwîsî: heke ez şiyam

biçime di kûratiya dilê Diblin da; paşî ez dê şêm çime di kûratiya hemû bajêrên cîhanê da. Anku, taybet ji tevayê jî pêkidhêt.

Ciwîs

Em neşêyin cîhana Ciwîsî bixûnîn; heke bagirawendê dîrokî yê bajêrê Diblin ewê Ciwîsî dijînwarê wêda tevnê romana xwe raçandî nexûnin. Helbet Ciwîs bi kûratiya Diblin daxibarbûye; ji ber hindê, her ma cîhana wî ya serekî ku çirikekê ji hizra wî neçûye derê.

Diblin a vî romannivîsî ew navende ewa kesokiyên wî têda jiyayin. Ew yên li rex û rûyên wê, di navbera wanan da radibît, kesokiyên wî, di vî bajêrî da, di hoşiyeka tevavdane. Di wî çaxê Ciwîsî, ewê koma xwe ya nexirî ya çîroka bi navê xelkê Diblin nivîsî, bi durisitî jiyara Diblin, têda wênekir. Evê koma çîrokan, giringiyeka mezin di karê Ciwîsî yên piştî hîngê da hebûye.

Ciwîsî li jyê bîst û dwyê, welatê xwe hêla û li derbederyê û di vederiya xweyetî da li orpa jiyaye. Helbet welatê wî girinkiyeka taybet di dahînana wî da hebûye; wekî diyar hemû karên wî bi giyanê Diblin ê mayîne zêndî. Ciwîsî herdem hest bi wê çendê dikir ku yê ji welatê xwe dûr e. Di serihindê ra, evê dûratiyê giringiya hunerê filîvaniya wî aşkera kir. Di wê derbederiyê de, Ciwîsî viya di ramana serbora xwe bigehe û mijarê vê serborê bo hunerî bivegohêze.

Yaron û aşkeraye, romanên wî yên din wênê hunermendî di lawîniyê de, Yolîsîs û şevbêriya finîganê ji giyanê Diblin ê destpêkirîne. Evî çêwey bandora xwe di karên wî yên wêjeyî yên zû û dereng de hebûye. Dibînîn geryanên li dor bajêrê Diblin ê di jiyê zarokîniyê de, di nav seqayê rewşa abûrekê lawaz de kesad û dijwariya ramyarî û babê herdem serxweş de ye.

Serkevtina wî ya xwandingehî li zankoya Kilonkos li jêr çavdêriya mamostayên wî yên mesîhî, şelejanên wî yên sêksî di jiyê sinêleyê de, paşî yaxîbûna li ser dînî û nerîtan kirî. Ciwîsî hişyarî li ser hemû dirîjiyên vê jiyarê hebûyine. Hişiyariya wî jî ya dijwar bûye; heya wî radidey neşiyaye digel

vî jîwarî bigunce; ji bilî jê havîbûnê û vegohaztina wê bo dahênaneka hunerî. Diyare jiyana Ciwîsî jiyana hunermendên cudaye. Sebaret vê çendê Rîtşard Îlman dibêje: ***"Jiyana hunermendî, nemaze jiyana Ciwîsî, cuda bûye ji yana kesanên din; ji ber hindê rûdanên jiyanê jêra bûyine rêjigehên hunerî."***3

Kiryara dubarekirina pêkhînana jiyanê bibû parçeyek ji yana wî. Koma xelkê di bilin ê wek wênebîriya wî ya hunerî bû li ser jiyara îrlenda hevçerx û di heman demî da, di bû kilîla giringa cîhana wî ya romanê. Anko wek pêşekiyekê bû ji romanên wî ra.

W. Î. Tindal dibêje: koma "xelkê Diblin "girftariya wê penaberyê aşkera dike, ewa derbirîn jêkirî di "wênê hunermend di lawîniya wî da "û "yulîsîs "anku ev kome berfirihed bît. Her bûyereka hebît; mîna berên gerok in, tiştekî ji xelkêd bilin ê dizivirîne. Piraniya kesokiyên xelkê di bilin ê di romana Yolîsîs da di yard bin, Diblin û xelkê wê û nêrîna filîvanî, ew e romanên Ciwîsî pêk ve girê didet.

Bi dirêjiya jiyana xwe Ciwîsî pêkolkirî ye, derbirînê ji gewher û rastyên Diblin ê biket; pişti hîngê bûye cîhan hemû û mijarê hunerî. Sebaret vê çendê di êvid dêgis dibêje: "Ciwîsî "îrlenda hêla; heya bi îrlenda binivîsît. Wî xwe ji yarê dûrêxist, ewa mijarê wî; heya bişêt wê jiyarê, di karê xwe yê hunerî da wêne û berceste biket. 4

Ciwîs î, di jiyana xwe da; wek hunermend, viya derbirînê ji jîwarê rasteqîneyê di bilin ê biket. Yaxîbûna wî dijî kinîştê ku yekemîn karê wî yê aşkerabû di pêşkêşikirina bajêrê di bilin ê da. Ciwîsî cîhana me ya hevçerx bi hemû alozî û zehmetên wêve ya ku derbarey wî cîhana wî ya biçûk hînaye. Dihête zanîn, Diblin bajêrekê şelelyê bin destê silltê bûye. Li dawiya romana xwe wênê hunermendî di tolaziyê da ew rad gehînît, wan amirazên cengê pêdike di çaxê bê dengyê da. Dê bînîn retkirina wî di harîkariya sîstemê civakî yê wî çaxî da; heta li derbederyê dê bînîn jêyatiya xwe bo retdket ku pişkdaryê têda biket. Dizîrekiyê da dê bînîn rijdiya wî li ser bi kar hînana navigînên erênî winerênî dicembaziyê da, pêxemet şkandin û xwe rizgarikirinê ye ji dujmnên xwe. Rexnegir dêvêd dêgis

karên Ciwîsî yên wêjeyî, di çar qonaxan da ji hev divavêrît û di bêjît:
li wêrahenê çiwar qonaxên jiyana Ciwîsî hene wek nivîser. Ya yekê:
Qunaxa koma-xelkê Diblin êDi vê qonaxê da, Ciwîs dîmenên kurt ji rewşa jiyana ku ew bi xwe pirtek bû ji wê jiyanê dide me; sererayî vexwandin û şirovekirinên wî yên mijarane. Ciwîs pişkeke ji îrlenda bi heman rêka mijewiya Çîxof pirtek ji rosiya di çîrok û şanoyên xweda diyarikirî.
Ya di wyê: Pêşkêşikirina wênekê otobyografî; wek vekolîneka pakij, sebaret peywendiyên wî bi wan hêzên tepeserdken û zanîna wî ya pîçpîçe ku di binî da nabît, mana wî ya dirêj di jîwarekê hosada; pêxemet bi destive hînana wî cûnê Kemaliya hunerî ye, ewa dibîte armanca wî.
Ya siyê: Qonaxa destpêkirinê, berf afirandin û dahênanê di zimanî da, li ser astên hunerî û çevengî. Ji encamên giringên vê qonaxê nivîsîna romana Yolîsîs bûye.
Ya çiwarê: Di vê qonaxê da şevbêriya fenîgan ji berihemên wî bûye. Di vê romanê da Ciwîs bi rêkeka xurî çevengî, bi dawîhatina ji yana xwe di afirînît û şêwazê vegêrana hunerî, ewê di Yolîsîs da bi kar hînay di hêlît. Ciwîs şiya elementê çevengî rêkibêxît wiberfiriheket li serihizir û teknîkê zallbbît. Ji wê xalê dûrtir çû; wesa dît, hember zimanê niglîzî bi xwe rikebere. Ew qonax bû ku gehiştina Ciwîsî nîşandket, ji rastîxwazyê bo çevengyê 5 .
Pitiriya nivîseran, wesa li qelemdden ku Ciwîsî pirtûkeka ji hejî di gelek pirtûkên pêk ve girêdayî da nivîsî ye. Ciwîsî bi xwe herdem wesa didît: Li wêrahenê joreka bi tinê bo romanekê bi tinê ya di dilê mirovî da hey; çaxê romanên din dinivîsît, hemû çaxan her ew romane, belê bi kirasên Hemereng dixemlînît.
Ciwîsî di gavekê da nêrîneka diwane dame, bo xwe û civakî, bo hunermendî û xelkî di cîhana meda û pêdiviya her yekî bi yê din aşkerakir. robirt s. Îf {ravekirineka nû bo Ciwîsî berper 198 }